bikin,da rola berdewamiya van mercên bêkêr ji holê rakin.Ev danûstandin û hewildan,di behweriyên me de,wê bibin gavavêtineke giranbuha ber bi pelandin û çaraserkirina piraniya astengên demane,yên ku xwe li dora zîlana rewşenbîriyeke resen radipêçin û nahêlin ku rojnamegeriyeke serbixwe û şûngirtî bimeye û cih bigre.Wilo jî,em dizanin ku gelek mercên derveyî desthilatdariya rewşenbîriya Kurdî,li Sûriyê,me di bin bandora xwe de digerînin û dibin sedema sereke ji neşûngirtineke rojnamegerî re.Ji van sedeman: neyîniya pergal û yasayên rêdaneke serfiraz ji çapemenî û rojnamevaniyê re,binçavkirina hemî kiryarên serbixwe ji hêla rejîmê ve,raspêriya hêzên ewlekariya rejîmê di warê raxistina bîr û behweriyên rewşenbîrî de,di warê bidestxistina desthelatdariyeke eborî de,di warê mafdariya bidestxistina dezgehên weşan û belavkirineke serfiraz de,di warê hebûna alavên rûdaneke rewşenbîriyeke serfiraz û bê kontirol de...û di gelek warên din de.

Lê belê,bi ser van kul ,derd, êş û azeriyan de jî,em bi hêvî ne ku wê dem gerş û gemara xwe bi xwe re bimale...û ev bîranîn, li ba kovar,nivîskar,çalakvan û rewşenbîriya Kurd bibe gaveke pîroz di hewildana avakirina çapemeniyeke bi rûmet û hêzdar de û wê bibe durv û. nîşanên civakeke saxlem Û hersal cejna rojnamegeriya kurdî li we pîroz be.

Komîta Kovarên
Berpirsiyar18/04/2007

Li Sûriyê Pêkenoka Hilbijartina Perlemanê

Dîsa , piştî çar salan , destlata Sûriyê ji heyvekê ve , dest bi reqepeq û xirecira hilbijartina (encûmema gel) kiriye . Bi hemî şêweyan piropoganda jeer kiriye , wekî ku, rast hilbijartin wê bê kirin . Herweha hîştik ku , dora 10000 kes , (çi ji yên berjewandên wan bi rêjîmê ve girêdayî yan jî yên tirsonek) , daxwaza xwepêşandana xwe bidin , û ta ku , li dawiyê ji wan 2500 nûner bimîne û berdewam bike . Bi ser ku , heryekî ji wan komek xeric ji bo piropoganda bi hemî awan virde û wêde rijandin .Lê , dîsa destlata Sûriyê weke hercar **Lîsta Zil** bi derxist . Herweha berî hilbijartin dest pêbibe , hemî kesên diçin perlemanê xuyadibin .

Ev çi şêt e ?!.

Hêjaye em bi bîra xwendevanan wînin ku, ragiyandina Şam û tevgera Kurd li Sûriyê , bi baweriya ku tu hilbijartinên azad li Sûriyê di siya van zagonên awerte de nîne , ji zû ve biryar dan ku , ne wê navan pêşkêş bikin , ne jî wê biçin dengdanê . Xuyaye tiştê bûye jî , rastîna wê tekûz dike .